Ji bo welî û zarokan

Aşîlêdana li dijî Covid-19 ji bo zarokên 12 salî û mezintir

Folkhälsomyndigheten

Covid-19 nexweşiyek pir têgerber e. Aşîlêdan parastineke bi bandor peyda dike li dijî nexweşiyê.

Hem zarok û hem jî mezin dikarin bi Covid-19 nexweş bikevin. Zarok bi gelemperî sivik nexweş dikevin, lê hin ji wan jî bi giranî nexweş dibin an jî ji bo demeke dirêj nexweş dibin. Aşîlêdan alîkariya laşî dike da ku laş xwe li hevber nexweşiyê biparêze. Hemî zarokên ku gihîştine 12 saliya xwe dikarin li dijî Covid-19 aşî li xwe bixin. Aşîkirin serbest û belaş e.

Vîrus bi hêsanî belav dibe

Covid-19 nexweşiyeke têgerber e. Dema ku hûn nexweş bin li malê bimînin xetera belavbûna enfeksiyonê kêm dike, lê ne mumkun e ku hûn belavbûna enfeksiyonê bi tevahî rawestînin. Aşîlêdan awayê herî bi bandor e ji bo parastina zarokan li hevber nexweşiya Covid-19.

Aşîlêdan diparêze

Aşî bi baldarî hatine ceribandin da ku zarokan ji nexweşiyên giran biparêze û karanîna wan ewle be. Bi mîlyonan zarok li çaraliyê cîhanê dijî Covid-19 aşî li xwe dane.

Carinan diqewime ku nexweşî bi we digire herçend hûn aşî bûbin jî, lê ev ne tişteke ne normal e. Heger biqewime, hûn bi gelemperî tenê piçek nexweş dibin. Herçend ku we li dijî Covid-19 aşî li xwe xistibe jî, heger we serma girtibe yan we nexweşiyek hebe, girîng e ku hûn li malê bimînin.

Derbareyê aşîlêdanê

Berî aşîlêdanê, divê hûn pirsên li ser rewşa tendurustiya zarokê xwe bibersivînin, bo nimûne, ger zarokê we ji tiştek re alerjîk (hessas) be. Aşîlêdan bi derziyê li hêla milê jorîn tê dayîn.

Zarokên we dikare piştî aşîlêdanê xwe wisa hîs bikin

Pir zarok piştî aşîlêdanê xwe baş hîs dikin. Hin zarok diwestin, laşê wan bi tayê dikeve yan diêşin. Ev reaksiyoneke normal e û kesê ku hatiye aşîkirin tenê hewce dike roja ku vê yekê hîs dike bêhna xwe veke. Her weha dibe ku milê derzî lê hatiye xistin biêşe.

Bandorên cidî yên piştî aşîlêdanê pir kêm in. Lê heger hûn xwe nexweş hîs bikin û nîşanên ku piştî aşîlêdanê li cem we hebin ku hûn nas nakin, hingê girîng e ku hûn li nexweşxaneyê bigerin. Bandoreke pir kêm a piştî aşîlêdana li dijî Covid-19, îltîhaba masûlkeya dil e. Wê gavê hûn dikarin bi êşa sîngê û tengasiya nefesê bikevin. Lêbelê, girtina îltîhaba masûlkeya dilî, li enfeksiyonên din ên vîrusî pirtir e, bo nimûne ji piştî ketina nexweşiya Covid 19 ji ber aşîlêdana li dijî Covid-19. Heger zarokê we nexweş be, hûn dikarin ji bo rêberî û şîretan li 1177 Vårdguidenê bigerin.

MA TE PIRS HENE?

Bi gelemperî pirsên berî aşîlêdanê hene. Hûn dikarin li malê derbareyê aşîlêdanê biaxivin û van agahiyan bi zarokê xwe re bixwînin.

Agehiyên bêhtir li vir hene:

- 1177.se
- Folkhalsomyndigheten.se

Li ser malpera 1177.se hûn dikarin fêr bibin ka li ew cîhê ku hûn lê dimînin derfeta derzîkirinê li wir çawa bi dest dikeve.

Heger hûn bêhtir agahdarî bi zimanekî din ji Swêdî bixwazin, li vê telefonê bigerin: 08-123 680 00



FOLKHÄLSOMYNDIGHETEN 2021 ARTIKEL KURMANJI 21211-4

Solna Nobels väg 18, 171 82 Solna. Östersund Campusvägen 20. Box 505, 831 26 Östersund.
www.folkhalsomyndigheten.se